

# NÛÇEGÎHANIYA RAST

## Û ETÎKA MEDYAYÊ

# Nûçegîhaniya Rast
## û Etîka Medyayê

ISBN: 978-625-6281-37-0

**Nûçegîhaniya Rast**
**û Etîka Medyayê**

© 2024 **WEŞANÊN SEROKATIYA RAGIHANDINA SEROKOMARIYÊ**

**Hejmara Setrîfîkaya Weşanger:** 45482

**Çapa 1, İstanbul, 2024**

**Têkilî**
Kızılırmak Mahallesi Mevlana Bulv. No:144 Çukurambar
Ankara/TÜRKİYE
**T** +90 312 590 20 00 | webinfo@iletisim.gov.tr

**Çap**
İhlas Matbaacılık Gazetecilik A.Ş.
Hejmara Belgeya Çapxaneyê: 45589

# Nûçegîhaniya Rast
## û Etîka Medyayê

SEROKOMARÎ
WEŞANÊN SEROKATIYA RAGIHANDINÊ

SEROKOMARÎ ★ WEŞANÊN SEROKATIYA RAGIHANDINÊ ★

# NAVEROK

**Pêşgotin** 7

**Pêşkêşî** 9

**Beşa I**
**Endamtiya Pîşeyî** 13
- Peywir 15
- Berpirsiyarî 15
- Serbixwebûn 17
- Nûçegîhaniya Heqîqî û Rast 18
- Bêalîbûn 19
- Rêzgirtina Li Mafên Mirovan ên Gerdûnî 20
- Pêbawerî 21
- Dadperwerî 22

**Beşa II**
**Çavkaniya Nûçeyê** 25
- Biteraz û Rast û Darperwerbûn 27
- Destûra Hevpeyvîn, Tomar û Wêne 28
- Eşkerebûn 29
- Çavkanî Ji Mirovên Zana 29
- Çavkanî Ji Zarok, Ciwan û Kesên Hestiyar 30
- Verastkirina Beriya Weşanê 31
- Lêkolîn û Îstatîstîk 32
- Nepenîbûn 33
- Întihal 34
- Çavkaniyên ku bi Rêyên Nemeşrû Hatine Bidesxistin 35
- Sûd Wergirtin ji Agahiyan 36
- Nûjeniya Çavkanî û Anîmasyon 36
- Destheqê Telîfê 37
- Dîroka Weşanê 38
- Bikaranîna Ziman 38

**Beşa III**

**Awayê Pêşkêşkirina Nûçeyê** 41

*Awayê Pêşkeşkirina Nûçeyan Li Ser Bingeha Destwerdana Jiyana Taybet û Mafên Kesane* 43

Sînorê Azadiya Derbirînê 43

Nûçeyên Adlî 44

Nûçeyên Mexdûran 46

Mexdûrên Zarok 46

Nûçeyên Derbarê Parêzbendiya Cinsî 47

Nûçeyên Xwekuştinê 47

Nûçeyên Rewşa Tendirustiyê 49

*Awayê Pêşkêşkirina Nûçeyan Li Ser Bingeha Ewlekariya Giştî û Berjewendiya Giştî* 49

Pêşîniya Berjewendiya Giştî 49

Raza Dewletê 50

Nûçeyên Terorê 50

Nûçeyên Krîz-Afatan 53

Nûçeyên Aboriyê 54

Pêşkêşkirina Şîdetê 55

Mustehcenî 57

Tiryakiya Madeyên Hişber û Titûnê 57

Komên Hesas 59

Peywirdar 60

Penaber 60

Cihêkarî û Halantêdan 61

Nûçeyên Tenduristiyê 63

Kampanyayên Hilbijartinê 64

Reklam 65

Weşandina Lêkolînên Raya Giştî 65

Parastina Jîngehê 66

**Beşa IV**

**Rastkirina Nûçeyê û Mafê Bersivdayînê** 69

Rastkirina Nûçeyê 71

Nameyên Xwîneran 72

Mafê Bersivdayînê 73

**Beşa V**

**Bikaranîna Medyaya Civakî ya ji Hêla Nûçigîhanan** 77

Berpirsiyarî 79

Hesabê Profîlê ya Bikarhêner 80

Telîf 80

Pêbaweriya Hesabên Din 81

Bikaranîna Medyaya Civakî di Nav Qeyranan de 82

Ziman û Vegotin 84

**Çavkanî** 86

# PÊŞGOTIN

Peywira medyayê ya ku ji bo takekes mafê xwe yê agahdarî û nûçeyan bi kar bînin û ji ber vê yekê jî di xurtkirina demokrasiyê de roleke girîng dilîze, li ser esasê "pêşkêşkirina nûçeyan bi awayekî rast û di wextê xwe de ji civakê re" ye. Eger rojnamegerî bi perspektîfeke profesyonel, li ser bingehên prensîbên exlaqî were kirin ev yek mimkun e. Li ser vê rastiyê ji aliyê gelek saziyên çapemeniyê ve gelek prensîbên pîşeyî hatine diyarkirin û ketine pratîkê.

Dema ku em li mînakên cîhanê dinêrin, em dibînin ku rêbazên wisa tên danîn ku di esasê xwe de rêzê li mafên kesane digirin, nûçegîhaniya azad û bêalî li ser bingeha berjewendiya giştî dikin armanc, nûçegîhaniya ji çavkaniyên piştrastkirî, bi rêbazên ku mafên kesane û berjewendiya giştî diparêze, pêşniyar dike û mekanîzmayên ragihandina paşve yên wekî dergevanên şêmûkan û koma nûçegîhanî û edîtorî û nûneriya hemwelatiyan û rêbazên ku nûçegîhaniya bêalî û mafparêz bi xwe ve digirin.

Ji aliyê din ve jî mirov dikare pêşbînî bike ku bi awayekî sîstematîk van rêbazan li hev kom bikin û bixin pratîkê, dê nûçegîhaniya rast û pêbawer pir hêsan bike.

Li ser vê pêşbîniyê, ev rêber ji aliyê Serokatiya Daîreya Ragihandinê ya Serokatiya Komara Türkiyeyê ve bi prensîbên ku di çarçoveya mînakên cîhanê de hatine berhevkirin û sîstematîzekirin, ji bo hêsankirina karê endamên çapemeniyê yên ku armanca wan rojnamegeriya rast e, hatiye amadekirin.

SEROKOMARÎ ★ WEŞANÊN SEROKATIYA RAGIHANDINÊ ★

# PÊŞKÊŞÎ

Kodên exlaqî yên ku li dora nirxên wekî rastbûn, durustî, serxwebûn, objektîvbûn û bêalîbûn tên çêkirin wekî standardên bingehîn ên exlaqê medyayê derdikevin pêş. Di bingeh de, hewl tê dayin ku pêbawerî bi rêzikên exlaqî ve were sazkirin ku divê çalakiyên medyayê birêkûpêk bikin. Îro, pirsgirêk û nîqaşên li ser etîka medyayê bi lez û bezbûna medyaya înternetê û medyaya civakî ji sînorên medyaya kevneşopî derbas bûne û derbasî qonaxeke din bûne.

Ji bilî qirêjiya agahî, dezenformasyon, nûçeyên sexte, binpêkirina nepenîtiyê û axaftinên nefretê, pirsgirêkên exlaqî yên ku ji ber reklam, mafên telîfê û meylên bazirganî tên çêkirin di medyaya kevneşop, medyaya înternetê û medyaya civakî de pêk tên. Bi taybetî medyaya civakî û medyaya înternetê wekî derdorên ku etîka pîşeyî tê paşguhkirin, navûdeng tê xerckirin û ji ber vê yekê gelek binpêkirin derdikevin pêş. Mixabin, bedkarî û binpêkirinên exlaqî di hawîrdorên ragihandinê de zêde bûne ku kesên ku ne xebatkarên çapemeniyê yên profesyonel in di hilberîna naverokê de cih digirin.

Çapemeniya ku roleke wê ya girîng heye ku takekes mafê xwe yê wergirtina agahî û nûçeyan bi kar bînin û ji ber vê yekê jî di xurtkirina demokrasiyê de, bêyî dûrketina ji prensîbên exlaqî tenê bi hilberîna pîşeyî dikare vê erkê pêk bîne. Bicihhanîna sîstematîk a van prensîban dê bi rastî rola jiyanî ya ku nûçegîhaniya rast û pêbawer ji bo demokrasiyê dilîze eşkere bike.

Wekî ku Serokomarê me Birêz Recep Tayyip Erdogan jî gotiye, "Taybetiya heî girîng a vê pîşeyê veguhastina heqîqetê ji xwêner û temaşevanan re ye" Berpirsiyariya herî mezin a parastina exlaqê medyayê bêguman dikeve ser milê rojnamegeran. Endamên çapemeniyê yên ku ji etîka medyayê dûr nekevin, wê bibin garantiya rêzgirtin û pêbaweriya pîşeyê.

Bi baweriya min ev rêber ku me wek Serokatiya Ragihandinê ya Serokomariyê bi prensîbên ku di çarçoveya mînakên navneteweyî yên etîka medyayê de hatine berhevkirin û sîstematîzekirin amade kiriye, ji bo pispor û lêkolînerên medyayê dê bibe çavkaniyeke girîng. Bi vekolîna kodên exlaqî yên ku li çaraliyê cîhanê di warê medyayê de tên pejirandin, di bin sernavên "Endamtiya Pîşeyî", "Çavkaniya Nûçeyan", "Forma Pêşkêşkirina Nûçeyan", "Mafê Serastkirin û Bersivdana Nûçeyan", "Bikaranîna Medyaya Civakî Ji Hêla Nûçegîhanan Ve" de cih digirin.

Ez spasiya xwe wan kesan dikim ku di amadekirina vê xebatê de keda wan çêbûye e û serketinê ji bo endamên çapemeniya me re dixwazim ku etîka medyayê diparêzin û ji xeta rastiyê dernakevin.


SEROKÊ RAGIHANDINA SEROKOMARIYÊ YA KOMARA TÜRKİYE
**PROF. DR. FAHRETTİN ALTUN**


268 .38



# 01

# Endamtiya Pîşeyî



SEROKOMARÎ

WEŞANÊN SEROKATIYA RAGIHANDINÊ

1

# ENDAMTIYA PÎŞEYÎ

## Peywir

- Peywira sereke ya endamên medyayê dema weşana nûçeyan ew e ku li gorî berpirsiyariyên xwe, li ser hemû mijarên berjewendiya giştî, agahî û ramanan belav bikin.

## Berpirsiyarî

- Endamên medyayê ji bo şopandin, lêkolîn, nirxandin, belavkirina bûyeran û bi vî awayî agahdarkirin, hînkirin, ronîkirin û rênîşandana mirovan rayedar û di heman demê de berpirsiyar in.
- Berpirsiyariya sereke ya endamên medyayê ew e ku rêz li mafê raya giştî ya hînbûna rastiyê bigire û wan bi awayekî rast û tam derbarê rastiyan de agahdar bike.
- Encamên wê ji bo wan çi dibe bila bibe, divê endamên çapemeniyê mafê civakê yê zanîn û hînbûna rastiyê biparêzin.

- Divê endamên medyayê beriya kardêrên xwe û rayedarên fermî divê ji raya giştî re berpirsyar bin.
- Divê endamên medyayê zanibin ku ew ji her tiştê ku dinivîsin berpirsiyar in.
- Divê endamên medyayê bi zanebûn tevbigerin ku ew ê di karê ku li derveyî pîşeya xwe dikin de wekî endamên pîşeyê werin dîtin.
- Divê endamên medyayê azadiya derbirînê û derfetên pîşeyê li gorî berjewendiyên xwe, ji bo bicihanîna daxwazên şexsî, ji bo bidestxistina qezencên bi her awayî ji bo xwe yan jî ji bo kes û rêxistinên din bi kar neynin û navê xwe û pîşeya xwe ji bo reklam û armancên bazirganî dernexin pêş.
- Divê endamên medyayê weşanên ku buxtan, îftira bi xwe ve digirin û rûmeta mirovan dişkînin neweşînin, xwe ji sûcdarkirinên bêbingeh dûr bixin û bi armanca weşandin û veşartina nûçeyan xwe ji stendina bertîl/diyariyan dûr bigirin.
- Divê endamên medyayê di wergirtina nûçeyan de hevkarên xwe asteng nekin û bi zanebûn wan nexapînin.
- Divê endamên medyayê li jêr karê kesekî din îmze nekin.
- Divê endamên medyayê bêyî destûra edîtor xebatên xwe radestî rêxistineke cuda nekin.

# Serbixwebûn

Divê endamên medyayê ji bo weşana ramanek an nûçeyê tu berjewendiyek darayî ya rasterast an nerasterast ji aliyên sêyemîn qebûl nekin.

Reklam an jî sponserî divê tu carî bandorê li ser gotar, şîrove an Naveroka nûçeyê neke, ne jî divê Endamê medyayê ji objektîfbûnê dûr bixe. Karmendên edîtorî divê tenê peywirên berpirsan qebûl bikin.

Girîng e ku di weşanan de prensîba azadiya derbirînê were şopandin.

Azadiya çapemeniyê di çarçoveya azadiya ramanê de pemenî xwedî mafê komkirin, weşandin û şîrovekirina agahiyan bê asteng be.

Endamê medyayê di amadekirina naveroka nûçeyan de divê nekevin bin bandora kesên ji derve, li hember daxwazên saziya ragihandinê ya destwerdana naverokê ya nûçeyan li ber xwe bide û bi tena serê xwe, bi nirxandinên edîtorî naverokê diyar bike.

# Nûçegîhaniya Heqîqî û Rast

» Divê endamên medyayê hewl bidin ku rastbûn û objektîfa nûçeyên ku dinivîsin/belav dikin piştrast bikin, û divê rê li ber tehrîbkirin û xeletfêmkirinê bigirin.

» Divê ferqa naveroka nûçeyê û şiroveyan bi zelalî were pêşkêşkirin û şirove tenê li ser ramanên giştî an jî bûyerên rojane werin kirin.

» Divê wêne û deng ji manipulasyonê re vekirî nebin.

» Divê endamên çapemeniyê belgeyên têkildarî nûçeyan neguherînin, nûçeyên ku ji bo civakê girîng in û bûyerên girîng ên civakî veneşêrin û hûrgiliyên girîng ji bîr nekin.

» Divê endamên medyayê di dema amadekirina naverokê de xwe ji mijarên nûçeyan yên sansasyonel dûr bixin û di vî warî de li hember her zextê bisekinin.


» Divê sernav, kurte, wêne û jêrsernivîs ji rastiyê dûr nekevin.

» Divê ji giştikirinên ku li ser yek bûyeran hatine çêkirin, xwe dûr bixin.

» Divê endamên çapemeniyê her tim parastina prensîba azadiya çapemeniyê bikin û ji bo rakirina tehrîf û sansurê hewl bidin.

» Diziya nûçeyan, berevajîkirina rastiyan, iftirakirin, binpêkirina şerefa mirov an îdiayên bêbingeh û her eleqeya ji bo manipulekirina nûçeyan divê weki êrîşeke giran li ser pîşeya rojnamegeriyê û xiyanet li baweriya raya giştî were dîtin.

# Bêalîbûn



- Divê endamên medyayê hewl bidin ku rastbûn û objektîfa nûçeyên ku dinivîsin/belav dikin piştrast bikin, û divê rê li ber tehrîbkirin û xeletfêmkirinê bigirin.
- Divê ferqa naveroka nûçeyê û şîroveyan bi zelalî were pêşkêşkirin û şîrove tenê li ser ramanên giştî an jî bûyerên rojane werin kirin.
- Divê wêne û deng ji manîpulasyonê re vekirî nebin.
- Divê endamên çapemeniyê belgeyên têkildarî nûçeyan neguherînin, nûçeyên ku ji bo civakê girîng in û bûyerên girîng ên civakî veneşêrin û hûrgiliyên girîng ji bîr nekin.
- Divê sernav, kurte, wêne û jêrsernivîs ji rastiyê dûr nekevin.
- Divê endamên medyayê dema ku naverokê amade dikin xwe ji mijarên nûçeyan yên hestiyar dûr bixin û li hember zextên di vî warî de yên ku ji hundir û derveyî cîhana medyayê derdikevin bisekinin.

- Diziya nûçeyan, berevajîkirina rastiyan, îftirakirin, binpêkirina şerefa mirov an îdiayên bêbingeh û her eleqeya ji bo manîpulekirina nûçeyan divê wekî êrîşeke giran li ser pîşeya rojnamegeriyê û xiyanet li baweriya raya giştî were dîtin.
- Divê endamên çapemeniyê her tim parastina prensîba azadiya çapemeniyê bikin û ji bo rakirina tehrîf û sansurê hewl bidin.
- Divê ji giştîkirinên li ser bûyerekê hatine kirin, xwe dûr bixin.

## Rêzgirtina Li Mafên Mirovan ên Gerdûnî

- Divê endamên medyayê di karê xwe de tu cudahiyên nijadî, etnîkî, olî û çînî nekin û îfadeyên ku rûmeta mirovan binpê dikin bikar neynin.
- Ji bo ku xizmetên weşanê ji mijarên wekî exlaqê giştî, parastina malbatê û nirxên netewî û manewî yên civakê dûr nekevin, divê gelek baldar bin.



# Pêbawerî

- Dema ku endamên medyayê ji ber sedemên xweperestî an jî armancên bêbingeh sûd ji pîşeya xwe bi kar tînin, ev tê wê wateyê ku ew bi baweriya gel a bi wan re ne dilsoz in.
- Di nûçeyê de divê reklamên veşartî nebin, divê reklam li cihekî cuda bin.
- Divê endamên medyayê bêyî ku nakokiyên potansiyel an jî berjewendiyên xwe li ber çavan bigirin nûçegîhaniyê bikin û divê ji rêbazên nûçegîhaniyê tawîz nedin.
- Divê raya giştî bê teşwîqkirin ku gazincên li hember medyayê bîne ziman, xeletiyên muhtemel di dema herî zû de werin pejirandin û sererastkirin.
- Divê endamên medyayê ji helwêst û tevgerên ku mirov aciz bike ji bo çêkirina nûçeyan dûr bikevin.
- Eger endameke/î medyayê ji bo berjewendiya xwe yan jî ji ber sedemên din nûçeyeke girîng a ji bo civakê neweşîne, tê qebûlkirin ku azadiya raya giştî ya wergirtina nûçeyan asteng kiriye.
- Divê endamê medyayê axaftina kesê ku pê re hevpeyvîn dike, mane û armanca hevpeyvînê manîpule neke.
- Endamên medyayê ji bo parastina naveroka nûçeyên ku di bin îmza, nasnav an jî nenaskirî de bi zanîn û erêkirina xwe diweşînin, pêbawer û dadperwer bin divê bi rastgoyî û objektîf tevbigerin.

# Dadperwerî

- Divê endamên medyayê dema ku naveroka nûçeyan çêdikin rêz ji mafên kesane re bigirin, rêzikên exlaqî yên ku ji hêla civata giştî ve hatine pejirandin bişopînin û ji bo rastbûn û dadperweriya nûçeyên xwe berpirsiyar bin; kesên ku di raya giştî de tên sûcdarkirin divê mafê ji wan re were dayîn ku di wextê herî guncan de bersivê bidin.
- Divê endamên çapemeniyê rêzê li mafên pîşeyî yên hevkarên xwe bigirin û xebatên xwe li gorî rêzikên pêşbaziya adil bimeşînin. Divê endamên çapemeniyê zirarê nedin berjewendiyên hevkarên xwe.
- Divê endam û rêxistinên medyayê bi hevrikên xwe re ji bo zêdekirina dahata xwe ya bazirganiyê nekevin pêşbaziya neexlaqî û rê nedin rêbazên ku neqanûnî ne an jî bi nûçegîhaniya exlaqî re li hev nakin.
- Hewldanên têkbirina navûdengê bazirganî yên dezgehên medyayê yên din û pêşbaziya nedadperwer bi rêya daxistina bihayan, bi etîka nûçegîhaniyê re li hev nayên.
- Divê endamên medyayê di bin navê pêşbaziyê de bi zanebûn û eşkere zirara pîşeyî nedin hevkarê xwe û nekevin tevgerên ku weşana hevkarê wan asteng bike.











# 02


# Çavkaniya Nûçeyê

SEROKOMARÎ
WEŞANÊN SEROKATIYA RAGIHANDINÊ

2

# ÇAVKANIYA NÛÇEYÊ

## Biteraz, Rast û Dadperwer bûn



- Rêbaza ku divê nûçe li ser çavkaniyekê bin bingeh e.
- Divê endamên medyayê piştrast bin ku agahiyên ku ew bikar tînin rast, hevseng û dadperwer in û çavkaniya agahiyê pêbawer e.
- Ti sedem peydakirina agahiyên derewîn an nerastkirî rewa nake.

# Destûra Hevpeyvîn, Tomar û Wêne


- Endamên medyayê nikarin bi tirsandin û tacîzê nûçe û wêneyan bi dest bixin.
- Endamên medyayê mafê kesên xwezayî û yasayî û welatiyan qebûl dikin û rêzê li wan digirin ku agahî nedin û bersiva pirsan nedin, her çend e mafê agahdarbûnê parastî ye.
- Divê wêneyên cihên taybet ên mirovan bêyî destûra wan neyên girtin.
- Her çend rewşa îdeal ew e ku kesên ku hevpeyivîn bi wan re hatine kirin guhertoya dawî ya hevpeyvînê bipejirînin, lê eger ji ber kêmbûna demê destûr neyê girtin, divê pêşwext ew werin agahdar kirin ku dê hevpeyvîn were weşandin.
- Divê ji wî kesî re ku hevpeyivîn pê re tê kirin were gotin ku dê di kîjan şert û mercan de îfadeyên wî werin bikaranîn û gelo ew ê tenê ji bo armancên weşanê werin bikaranîn an tenê wekî materyalek çavkaniyê bimînin.
- Di bikaranîna wêneyên kolanan de, divê ji rewşên ku zirarê bidin namûs û şerefa kesên ku wêneyên wan bi awayekî rasthatî di nav de ne, dûr bin.



## Eşkerebûn

- Endamên medyayê xwedî maf in ku nehîniya profesyonel biparêzin, lê ev yek ji bo endamê medyayê mecbûrî ye ku pêbaweriya çavkaniya agahiyan garantî bike.
- Divê endamên medyayê dema ku agahiyan berhev dikin, nasname û karê xwe her tim eşkere bikin.
- Divê endamên medyayê di weşanên xwe de rewşa agahîyên nepejirandin û montajên wêneyan bi zelalî diyar bikin.

## Çavkanî ji Mirovên Zana





- Endamên medyayê divê bi girîngiyek taybetî agahiya ji kesên ku di bin stres an şokeke giran de ne, an ji kesekî ku yekem car bi endameke/î medyayê re hevdîtin pêk tîne, binirxînin.
- Eger kesê ku jê agahî tê girtin îtîrazên wê/î hebin, eger mirov di bin stres an şokê de be, an jî astengiyeke laşî hebe, divê endamên medyayê qeydên deng û vîdeoyê bikar neynin.

# Çavkanî Ji Zarok, Ciwan û Kesên Hestiyar

- Zarok û ciwanên negihîştî an kesên ku tam ji aliyê derûnî û laşî ve ne jêhatî ne, an jî di rewşeke zêde hestiyarî de ne, ji bo bidestxistina agahiyê nayên îstismarkirin.
- Rewşeke ku bandorê li kesayetî û tevgera zarokan bike hebe yan nebe, divê bêyî hebûna malbata wan an mezinekî ku ji zarokê berpirsyar e, an jî bêyî destûra malbatê bi zarokan re hevpeyvîn neyê kirin, wêne neyê girtin.
- Dema ku li dibistanê bêyî destûra rayedarên dibistanê divê nêzî xwendekaran nebin û wêne neyên girtin.
- Divê li ser mijarên ku ji ber temenê wan ne mimkûn e ku bersivê bidin zarokan nêrîna wan neyê pirsîn.




# Verastkirina Beriya Weşanê

- Endamên medyayê divê agahiyên ku hêla çavkaniyên wan ve hatine dayîn kontrol bikin.
- Endamê medyayê divê berî ku hevpeyvîn were weşandin, eger hebe daxwaziya kesê ku pê re hevpeyivînê dike bicih bîne da ku kontrol bike ka agahiyên taybetî yên ku wî dane rast in an na.
- Berî weşandina nûçeyek an şîroveyekê ku kesekî tawanbar dike, divê rastbûna wê ji hêla edîtor ve ji çavkaniyên cihêreng were destnîşankirin.



# Lêkolîn û Îstatîstîk



- Divê rastbûna nûçeyê bi hemû çavkaniyan were lêkolînkirin û di bikaranîna çavkaniyan de hesasiyeta herî zêde were nîşandan da ku ji xeletiyan dûr nekevin.
- Divê faktorên ku çavkaniya nûçeyê motîve dikin werin lêkolînkirin.
- Mafê endamên medyayê heye ku li ser mijarên berjewendiya giştî xwe bigihînin hemû çavkaniyên agahiyê. Di vê çarçoveyê de eger daxwaza bidestxistina agahîyan bê sedem neyê qebûlkirin, mafê endamê medyayê heye ku di vê mijarê de raya giştî agahdar bike.
- Dema ku daneyên ku bi îstatîstîkan hatine bidestxistin tên bikaranîn, divê bal were kişandin ku ew li gorî çarçoweya xwe rast bimîne û divê ev dane bi awayekî xirab neyên bikaranîn.
- Çavkaniya agahiyên îstatîstîkî divê di naveroka nûçeyê de were diyarkirin.

# Nepenî




- Divê endamên medyayê çavkaniya nûçeya ku bi nepenî tê gihîştinê wek razeke pîşeyî biparêzin.
- Tu kes nikare endamekî medyayê neçar bike ku çavkaniya nûçeya xwe eşkere bike.
- Divê endamê medyayê daxwaza kesê ku hevpeyivînê pêk tîne ku daxuyaniyên wan bi fermî neyên eşkerekirin pêk bîne.
- Divê di brîfîng û hevpeyivînên paşerojê de ku nepenîtiya wan li ser hatiye lihevkirin were bicihanîn.
- Divê weşangerên medyayê ji bo parastina agahî û çavkaniyên nepenî yên di derbarê agahiya giştî de hesas bin.
- Endamên çapemeniyê nikarin agahiyên nepenî û girîng ên ku bi awayekî profesyonel bi dest xistine ji bo berjewendiya xwe bikar bînin.

# Întihal

- Girtina nûçeyan ji nûçegîhanên din û weşandina wan wekî nûçeyên xwe bêyî ku çavkaniyê bilêv bike, sûcê întihalê ye.
- Eger endamekî medyayê bi her awayî sûdê ji xebata hevkarê xwe werbigire, divê bi nivîskar an jî xwediyê berhemê re bişêwire.
- Ger endamekî medyayê bêyî ku navê nivîskarê orîjînal an çavkaniya jêderê nas bike, bi tevayî an jî beşek ji xebata kesekî din, bi tevahî an jî beşek, wekî xebata xwe pêşkêş bike, dê navûdengê wî yê pîşeyî têkeve xeterê.
- Eger di weşanê de çavkaniyek din were bikaranîn, her çend qismî be jî, divê çavkanî jî were destnîşankirin.




# Çavkaniyên ku bi Rêyên Nemeşrû Hatine Bidestxistin



- Di nûçegîhaniyê de ji bo bidestxistina agahî, wêne û belgeyan bi rêbazên nerewa nayên bikaranîn.
- Nabe ku mirov bi tacîz an şopandina domdar hewl bide ku agahî an wêneyan bi dest bixe.
- Endamên medyayê ji bo agahî, deng an vîdeoyê nikarin nepeniya kesê ku mijara nûçeyê ye binpê bikin.
- Çavkanî bi qutkirina sohbetên taybet nayên bidestxistin û agahî, belge û dîmenên bi vî awayî hatine bidestxistin nayên weşandin.
- Divê endamên medyayê bi hincetên derewîn an bi xapandinê agahî û wêneyan bi dest nexin û hewl nekin.

## Sûd Wergirtin ji Agahiyan

- Endamên medyayê nikarin ji agahiyên ku di dema erka xwe de bi dest xistine, berî ku agahdarî ji raya giştî re were peydakirin, sûd werbigire.
- Endamên medyayê nikarin agahiyên nepenî yên ku di destê wan de ne bi awayekî profesyonel ji bo berjewendiya xizmên xwe an jî ji bo berjewendiya xwe ya kesane bikar bînin.



## Nûjeniya Çavkanî û Anîmasyon

- Divê nûjeniya wêne an dîmenên ku hatine weşandin bi zelalî were diyarkirin.
- Divê çawaniya arşîvê ya wêneyên ku tên bikaranîn bi rengekî zelal were xuyakirin.
- Di anîmasyonan de, divê ev rewş bi rengekî ku temaşevan bizanibe were diyarkirin.
- Divê anîmasyon çawaniyên xapîner pêşkêş nekin.
- Di weşana zindî de divê ev rewş bi peyva "zindî" bi awayekî zelal were nîşandan û bi devkî jî were vegotin.

# Destheqê Telîfê



- Parastina mafê telîfê ji bo endamên medyayê berpirsiyariyeke exlaqî ya bingehîn e.
- Dizîna fikir û xebatan bi tevahî an jî beşekê, eşkere an veşartî, binpêkirina berpirsiyariyê ya ku nayê qebûlkirin nîşan dide.
- Di rewşên lezgîn de, eger materyal ji weşanên din werin girtin bêyî ku hewceyê destûreke lezgîn ji xwediyê mafê telîfê hebe, divê materyal bi kurtahîyeke maqûl û bi navgînên sînorkirî were bikaranîn û çavkanî heya ku gengaz be were referanskirin.
- Di mijara bikaranîna berfireh an çapa materyalên bi mafên xwerû de, divê destûreke taybetî were wergirtin heke li ser materyalê hatî girtin were diyar kirin ku divê destûreke taybetî ji xwediyê mafê telîfê were wergirtin.

## Dîroka Weşanê

- Divê rêz li sînorê dema ku ji bo roja weşanê hatiye destnîşan kirin were girtin.
- Divê endamên medyayê di derbarê dîroka weşandina agahî an belgeyên ji bilî yên ku rasterast ji hêla endamên medyayê ve hatine wergirtin, daxwazên çavkaniyê bicîh bînin.



## Bikaranîna Ziman

- Divê ji bo rêzikên zimanê weşanê baldar bin.
- Divê bal were kişandin ser asta zimanê ku tê bikaranîn, ji gotinên rûreş, çort û argo dûr bin.








# 03

# Awayê Pêşkêşkirina Nûçeyê

SEROKOMARÎ
WEŞANÊN SEROKATIYA RAGIHANDINÊ


3

# AWAYÊ PÊŞKÊŞKIRINA NÛÇEYÊ

## *Awayê Pêşkeşkirina Nûçeyan Li Ser Bingeha Destwerdana Jiyana Taybet û Mafên Kesane*

### Sînorê Azadiya Derbirînê

- Eger azadiya derbirînê bi mafên din ên bingehîn re nakok be, berpirsiyariya edîtorê ye biryarê bide ser pêşîniya kîjan mafî.
- Dema ku azadiya derbirînê tê bikaranîn, divê rêz li hêviyên rewa yên kesan ên nepenîtiyê were girtin.
- Divê endamên çapemeniyê rêz li navûdengî û şerefa kesên ku di nûçeyê de cih digirin bigirin.
- Cih ji bo gotin an şîroveyên biçûkxistinê yên di derbarê nijad, netewe, koma civakî an zayendê de, her weha nexweşî an nerehetiyên laşî yên ku bandorê li ser kesê ku di nûçeyê de dike, nayê dayîn.
- Endamên medyayê berpirsiyar in ku xwe dûr bixin ji bikaranîna daxuyaniyên şermezarkirinê yên ku dibe sedema zirara manewî an laşî.



- Eger navê kesan neyê weşandin, divê endamên medyayê hûrgiliyên wekî wêne, pîşe, statû, temen, netewe, zayend û hwd. ku dibe sedema naskirina wan kesên navborî parve neke.

## Nûçeyên Edlî

- Divê endamên medyayê her tim bi rêzgirtina rêbaza pêşbîniya bêgunehiyê nûçeyan amade bikin.
- Berî ku bi fermî werin tawanbar kirin, divê di danasîna navên gumanbaran de helwesteke dadperwer were nîşandan.
- Divê di derbarê sûcan de nirxandinek pêşîn an pêşdarazî tune be. Divê li ser biryara dadgeh an jî rayedarekî texmînek neyê kirin.
- Divê endamên medyayê rêzê li mafê darizandineke adil bigirin.
- Beriya biryara dawîn a dadê sûcdar îlankirina gumanbar qedexe ye. Nav û wêneyên xizm an jî kesên din ên bandordar ên ku têkiliya wan bi sûc re tune ye, divê di nûçeyê de neyê bikaranîn.

- Eger endamekên medyayê berê li ser kesekî ku tê sûcdarkirin, lêpirsîn an jî doz lê hatiye vekirin, nûçeyekê çêkiribe, divê ji raya giştî re jî ragihîne ku ev kes hatiye beraat kirin an jî dev ji gumanbarkirinê hatiye berdan. Her weha divê hemî nûçe û gotarên berê yên li ser vê mijarê hatine weşandin, werin amajepêkirin.

- Divê endamên çapemeniyê bi tu şert û mercan nasnameya sûcdar an jî mexdûrên sûcên ji 18 salî biçûktir eşkere nekin.

- Tiştekî çewt e ku ji ber paşeroja xwe mirov were sûcdarkirin.


- Di dema lêpirsîna pêşîn de, divê ji amadekirina nûçeyên ku di lêpirsînê de qelsiyekê çêbike, dûr bin. Divê endamên medyayê nebin alîgirê pêvajoya darazê.

- Di dema ragihandina darazê de divê sûc û sûcdar neyên pesinandin, sûcdar neyên qehremankirin û birûmetkirin.

- Divê kesên mehkûm piştî ku cezayê wan biqede jî wek sûcdar neyê dîtin û mafên wan ên şexsî û rûmeta mirovî di nûçeyên çîrokan de werin parastin.

# Nûçeyên Mexdûran

- Berî bikaranîna hevpeyivîn û wêneyên mexdûran divê hesasiyeta herî zêde were nîşandan.



- Divê endamên çapemenîyê bi şert û mercên ku mexdûr, kesên sax û xizmên wan bandoreke neyînî li wan dikin binirxînin. Eger ku xizmên wan ji bûyerê nehatibin agahdarkirin teqez divê nasnameya van kesan neyê eşkerekirin.

# Mexdûrên Zarok


- Nasnameya zarokê di rapora çapemeniyê ya têkildarî bûyera sûcê zayendî ya li dijî zarok hatiye amadekirin de neyê eşkerekirin.
- Divê endamên medyayê di naveroka nûçeyên xwe de agahiyên li ser zarokan bi baldarî werbigirin. Eger ew di dozên kuştinê de mexdûr, bersûc an sûcdar bin û bi taybetî di rewşên ku dibe ku bertekeke giştî ya mezin hebe, wek tacîza zayendî, divê nasnameya zarokan neyê eşkerekirin.
- Di derbarê paşeroj û ewlekariya zarokan de dema amadekirina nûçeyan divê baldar bin.
- Eşkerekirina nasnameya zarokên ku li rastî îstîsmara zayendî hatine û çapkirina wêneyên wan qedexe ye.

## Nûçeyên Derbarê Parêzbendiya Cinsî

- Di nûçeyên der barê îstîsmara zayendî yên weke tacîz û tecawizê de, divê nasnameya mexdûran veşartî bimîne.
- Divê îfadeyên ku dikarin nasnameya mexdûr eşkere bikin, neyên bikaranîn.
- Divê di nûçeyan de hûrgilî heta radeya ku zirarê bide mexdûr neyên ragihandin.

## Nûçeyên Xwekuştinê

- Di nûçeyên xwekuştinê de, bi taybetî di veguhestina nav û bûyeran de, divê bi baldar bin û dîmenên bûyerê neyên weşandin.
- Divê dema weşana nûçeyên xwekuştinê li ber çavan bê girtin û nûçeyên bi vê naverokê di saetên diyarkirî yên ji bo zarokan hatine veqetandin de neyên nîşandan.
- Di dema pêşkêşkirina nûçeyên derbarê xwekuştin û hewldana xwekuştinê de, divê hestên xizm û mijarên bi jiyana taybet a takekesî re li ber çavan bên girtin.
- Divê di nûçeyên xwekujiyê de behsa awayê xwekuştinê neyê kirin û bûyer bi agahiyên herî hêsan û bingehîn, bêyî ku hûrgilî tê de cih bigirin, were ragihandin.
- Divê xwekuştin bi tu awayê neyê birûmetkirin û wekî kiryareke wêrek neyê nîşandan.
- Nûçeyên xwekuştinê divê di rûpelên yekem ên rojnameyan de, di manşetên malperan de, di televizyonan de bi gotina “nûçeyên dawî” neyên dubarekirin.



- Divê li ser kanalên medyaya civakî yên saziyên medyayê jî bi heman awayî nêzikahî li mijarê were kirin.
- Divê xwekuştin wekî rêbazeke çareserkirina pirsgirêkên gel neyê nîşandan, ji sernavên ku li ser têgînên xwekuştin û çareseriyê disekinin dûr bikevin û di vê çarçoveyê de bala xwe bidin zimanê nûçeyan.
- Divê bûyerên xwekuştinê bi çîrokên sir û evîndariyê re neyên balkêşkirin, û divê bal were kişandin ser xetereya ku ew wekî awayekî tevgerê yê populer were dîtin.
- Divê ji pêşandanên xwekuştinê yên ku dê statû, navûdeng, prestîj an navdariyê bide xwekuj, neyên kirin.
- Divê hûrgiliyên awayê xwekuştinê neyên dayîn û awayên xwekuştinê yên mîna ku berê li welatê me an jî li seranserê cîhanê qewimîne, divê bi rengekî ku were teqlîdkirin an kopîkirin neyê pêşkêşkirin.



## Nûçeyên Rewşa Tendirustiyê

- Divê di weşanên ku mirovên li nexweşxane û saziyên tenduristiyê tevdigerin de sînorkirinên nehîniyê werin pêkanîn.
- Nexweşî û nerehetiyên fizîkî û derûnî di nava qada taybet a mirov de ne. Divê endamên medyayê ji ber rêzgirtina nehîniya wan, nav û wêneyên kesên navborî û malbata wan belav nekin.

### *Awayê Pêşkêşkirina Nûçeyan Li Ser Bingeha Ewlekariya Giştî û Berjewendiya Giştî*

## Pêşîniya Berjewendiya Giştî

- Endamên medyayê, tevî astengiyên ku di pîşeya xwe de li rastî wan tên jî, ji lêkolîn û belavkirina nûçeyên ku di berjewendiya gel de ne û ji rastiya agahiyên ku di belgeyên mijara nûçeyê de cih digirin, berpirsiyar in.

## Raza Dewletê



- Divê rêzikên qanûnî yên di derbarê nehîniya dewletê de werin bicihanîn.
- Divê rêz li qedexeyên ragihandin û belavkirina agahiyan were girtin.

## Nûçeyên Terorê

- Dema şîdet pêk tê, wergirtina agahiyan ji rayedarên dewletê roleke mezin dilîze. Divê ji van çavkaniyan agahdariyeke domdar hebe da ku pêşî li gotegot, spekulasyon, dezenformasyon û panîkeke nehewce bigire. Di van rewşan de divê çapemenî û dewlet di nava hevkarî û lihevhatinekê de tevbigerin û berjewendî neyên parvekirin.
- Divê weşana ku sûc an helwestên xirab teşwîq dike neyê kirin.
- Daxwazên terorîstan heta ku ji destê wan tê bila bi gotinên endamên çapemeniyê werin ragihandin û rasterast ji devê terorîstan neyê dayîn.
- Ji bilî rewşên hewce, bûyerên revandin û binçavkirinê divê zindî neyên weşandin.
- Divê endamên medyayê hewl nedin ku bi çalakvanan re têkilî daynin, tevî ku ew dizanin ku dîl li ku derê ji hêla terorîstan ve tên ragirtin, û divê alîkariya karbidestên giştî û pisporên têkildar bikin ku van hewlan pêk bînin.

- Divê endamên medyayê û hêzên ewlehiyê di destpêka bûyerê de navên destûrdar bi hev re parve bikin da ku dema hewce bike têkiliyê deynin.
- Divê her bûyereke terorîstî bi awayekî biteraz were ragihandin ku nûçeyên din ên rojê neyên paşperdekirin.
- Divê tu nûçe terorê pesn nede û teşwîq neke, rêxistinên terorê xurt û mafdar neke û taybetmendiyên xof û tirsnak ên rêxistinên terorê nîşan nede. Naveroka nûçeyan nabe ku kiryara terorîstî, encamder û qurbaniyên wê bi awayekî ku xizmeta armancên terorê bike, pêşkêş bike.
- Divê rastiyên şer neyên nixumandin, divê rêz li rûmeta mirovahiyê jî were girtin.
- Wêneyên pir grafîkî yên şer û hovîtiyê divê tenê ji ber sedemên edîtorî yên rewa, bêyî balkişandineke zêde werin weşandin.
- Divê kiryarên terorîstî bi awayekî rast, bi temamî û bi berpirsiyariya edîtorî werin ragihandin.
- Di dema raporkirina kiryarên terorîstî de, divê bi baldarî werin ragihandin, bêyî ku bibe sedema tirs û hêrsê di nav gel de.
- Divê bal were kişandin ku kes an sazî wek hedefên êrîşa terorê neyên nîşandan.





- Wêneyên xwînê, parçeyên laş ên birî, birîndar û terman divê li ser ekranê neyên nîşandan.
- Divê bi bikaranîna deng û bandorên dîtbarî wêne ji ya rastî xirabtir xuya nekin.
- Nasnameya kesên ku birîndar bûne yan jî jiyana xwe ji dest dane, bêyî piştrastkirin neyê eşkerekirin.
- Weşana zindî ya kêliyên krîzê yên wekî revandin, korsanî, rehîngirtin û dorpêçkirin divê bi awayekî ku jiyana mexdûran bikeve xeteriyê neyê kirin. Divê weşan bi awayekî ku operasyona hêzên asayîşê eşkere dike neyê kirin û xebatên çapemeniyê li gor rêbazê û li qada ku hêzên ewlekariyê diyar kirine werin kirin.

# Nûçeyên Krîz-Afatan

- Divê endamên medyayê pêşî li xebatên rizgarkirina mexdûran û kesên di metirsiyê de di bûyerên qeza û karesatan de bidin û divê zanibin ku jiyana mirovan beriya mafê agahdarkirina gel girîng e. Mafê raya giştî ya wergirtina nûçeyan çalakiyên neqanûnî yên ku ji aliyê endamên çapemeniyê ve ji bo bidestxistina hûrgiliyên nûçeyan tên kirin rewa nake.
- Di bûyerên qeza û karesatan de, rizgarkirina birîndar û mexdûran dikeve pêşiya mafê civakê yê agahdarkirinê.
- Divê kar ji bo mexdûrên bûyer û karesatê her tim bi hestiyar û aqilmendî werin kirin.
- Divê endamên medyayê kesên ku ji ber krîz û karesatê ketiye taciz nekin û lawazî û nezaniya kesekî li hember medyayê îstismar nekin.
- Hûrgiliyên rengîn û xwînî û gotinên hestiyar ên der barê raboriyê de neyên bikaranîn.



# Nûçeyên Aboriyê



- Divê endamên medyayê di bin tu şert û mercan de agahdariya aborî û darayî ya ku distînin ji bo berjewendiya xwe bikar neynin.
- Divê endamên çapemeniyê bi belavkirina nûçe û bûyeran ji bo berjewendiya xwe rewşa borsayê xirab nekin.
- Divê endamên medyayê gotar û nûçeyan li ser stokên ku ji ber pîşeya xwe eleqedar in ku dê berjewendiya malî peyda bikin neweşînin, nefroşin an nekirin.
- Divê endamên çapemeniyê nûçe û agahiyên ku li gorî şert û mercên aborî yên dewlet, şaredarî, sazî, şîrket an jî kesên taybet nehatine weşandin, ji bo berjewendiya xwe û kesekî din bikar neynin.

# Pêşkêşkirina Şîdetê

- Divê şîdet û hovîtî wek bûyereke ku heyecan û tirsê di civakê de çêdike neyê veguhastin.
- Divê endamên medyayê dîmen û wêneyên kesên ku di bûyerên xof û yên ku şerefa mirov binpê dikin de cih digirin neweşînin û li ser hûrgiliyên şîdet û hovîtiyê nesekinin heya ku rewşek ku berjewendiya giştî hewce dike çênebe.
- Divê endamên medyayê ji gotarên ku li ber çavê civakê pesnê wan kesan dide yan jî rûmetê dide wan kesên ku şîdetê dikin dûr bikevin.
- Divê endamên medyayê bi hinceta çareseriya pirsgirêkên navneteweyî, piştgiriyê nedin şer, şîdet û êrîşan û nebin sedema bêtehamuliya siyasî, sivîl, nijadî, neteweyî û olî. Her wiha divê herî zêde rêz li dewlet û neteweyên din, li kevneşopiyên wan ên demokratîk, sazî, çand û nirxên exlaqî yên dewletan bigirin.






- Divê endamên medyayê ji bikaranîna îfadeyên ku şîdetê teşwîq dikin û zirarê didin nirxên exlaqî dûr bisekinin.
- Divê di hilbijartina wêneyên ku werin weşandin de, bi taybetî di destpêka bûyerên şîdetê de, gelek baldar bin.
- Di weşanan de divê tu carî wêneyên kesên ku di bin îşkence, kiryarên nemirovane, heqaret û cezakirinê de ne cih negirin.
- Divê kêliyên mirina mirovan bi awayekî ku bibe sedema îstîsmara hestiyarî an jî rê li ber tirs û hestên mîna wan veke neyê weşandin.
- Di xizmetên weşanê de divê şîdet ne di navenda bernameyê de be û bi dîmenên pir caran û dirêj ji temaşevanan re neyê nîşandan.
- Divê di saetên ku zarok timûtim televizyonê temaşe dikin de wêneyên tundûtûjî li ser ekranê neyên nîşandan.
- Dîmenên şîdetê yên ku di nûçeyan de zêde tê dîtin, divê bi teknîkên şêlûkirin an mozaîkan werin pêşkêş kirin.
- Dîmenên şîdetê yên di weşanan de divê mirovan teşwîq nekin ku sûc bikin. Bûyerên şîdetê divê bi hûrgilî neyên vegotin ku rê bidin ku sûcek were kirin.

## Mustehcenî

- Gotinên mustehcen, pûç û biçûkxistinê yên ku civakê bêzar dikin divê di nav weşanan de cih negirin.
- Divê endamên medyayê hêmanên ku ji bo teşwîqkirina sadîzm, mustehceniyê an hovîtiyê hatine çêkirin pêşkêş nekin.
- Divê di weşanan de deng û dîmenên ku ji bo teşwîqkirina pêlên zayendî bêyî hesta şermê cih negirin.
- Divê endamên medyayê baldar bin ku ji mijarên ku hesta şermê ya civakê aciz dikin û di weşanên xwe de xwestekên zayendî îstismar dikin dûr bisekinin.



## Tiryakiya Madeyên Hişber û Titûnê

- Di weşanan de, xetereya tiryakê divê bi hişmendiya ku ji bo hemû beşên civakê derbasdar e û wekî pirsgirêka komeke xwedî dahateke diyarkirî, perwerdehî an sosyo-çandî nayê nîşandan.
- Divê hesta başbûnê ya derewîn û demkî ya ku tiryak li ser kesan çêdike, bal li ser neyê kişandin.
- Divê ji rengdêrên ku bikaranîna titûn û maddeyên hişber normalîze dikin dûr bikevin.
- Divê îtîbara kesên tiryak neyê xerakirin û ew neyên vederkirin.

- Divê ji giştîkirinên ku mirov û saziyên taybet hedef digirin, xwe dûr bixin.
- Divê rêberî li ser tevgerên xelet bi dayîna agahdariya nehewce neyê dayîn.
- Divê peyamên li ser wê yekê ku ciwan çawa dikarin li hember helwest, bendewarî an daxwazên hevalan li ber xwe bidin.
- Pêvajoya dermankirinê divê rast were ravekirin.
- Divê di peyamên medyayê de peyamên nepenî yên teşwîqkar û balkêş neyên dayîn.
- Divê tiryakbûn wekî parçeyeke çanda populer neyê nîşandan.
- Maddeyên ku mirov dikin tiryak divê wek tiştên dilkê an bêguneh neyên nîşandan.
- Divê nirxa bazarê ya madeyên tiryakê neyê gotin.
- Teknîkên ji bo mijûlbûna bi tiştên tiryakê re divê neyên deşîfrekirin.
- Divê awayê jiyana bazirganên narkotîkê neyê teşwîqkirin.
- Divê aliyên hestiyar û tabloyî yên nûçeyên di derbarê tiryakê de neyên gotin, ji ber ku ew cidiyeta pirsgirêkê kêm dike û rê li ber nêzîkbûnek hesas a mijarê digire.
- Çîrokên serketî yên mirovên ku ji tiryakê xelas dibin divê werin nîşandan.

# Komên Hesas

- Di nûçeyên ku ji aliyê endamê medyayê ve hatiye amadekirin de divê li dijî zarok, kesên bêhêz û astengdaran îstismar tune be, şîdet divê neyê teşwîqkirin.
- Divê nûçeyên ku ji aliyê endamên çapemeniyê ve tên amadekirin nebin sedema newekheviya zayendî û kanalên televîzyonê jî ji amadekirina naveroka bernameya ku teşwîqkirina zexta li ser jinan û îstîsmara jinan dike, dûr bixin.
- Divê endamên çapemeniyê hin karan tenê bi zayendekê ve girê nedin û ji nêzîkatiyên zayendperest dûr bikevin.
- Divê endamên medyayê naverokekê ku laşê mirovan dike heyber an meta pêşkêş neke.
- Divê jin û endamên komên dezavantaj wek kesên bêçare di rola mexdûran de neyên nîşandan.
- Naverokekê ku bandoreke neyînî li pêşkeftina laşî, derûnî û exlaqî ya zarok û ciwanan bike, neyê weşandin.



## Peywirdar

- Divê karbidest dema ku nav an tiştên ku dikarin bibin sedema nasîna endamên dadgeha an polîsan diweşînin, gelek bi tedbîr bin.
- Ji bo ku bandorê li ewlekariya doz û lêpirsînê neke divê nav û wêneyên dadger û dozgeran di nûçeyan de cih negirin.
- Mafê karmendan heye ku jiyana xwe ya taybet nehînî bihêlin, heya ku bandorê li ser karê wan ê fermî neke, û tenê ji ber peywirên xwe nikarin ji mafê veşartina jiyana xwe ya taybet bêpar bimînin.




## Penaber


- Di weşanan de hûrgiliyên li ser nasname, rê û rêbazên revînê yên penaberan tên dayîn, divê bi awayekî bin ku malbat û hevalên penaberan ên li dû wan mane nexe xetereyê.

# Cihêkarî û Halantêdan

- Nijad, zayend, temen, ol, etnîsîte, erdnîgarî, astengdarî, xuyaniya fizîkî û statûya civakî divê tu carî neyên kesayetîkirin.
- Divê nûçeyên sûc tenê eger ji bo fêmkirina bûyerê girîng be behsa vê rastiyê bikin ku gumanbar an sûcdar ji komeke olî, etnîkî an hindikahiyeke taybetî ye.
- Divê endamên çapemeniyê di nûçeyên xwe de nirxên demokratîk biparêzin, xwe ji îfadeyên şîdet û nefretê dûr bixin û li dijî her cure cihêkariyê li ser çand, zayend û olê derkevin.
- Divê endamên çapemeniyê rêzê li nirxên netewî û civakî bigirin.
- Divê endamên medyayê ji ber xwezaya pîşeya xwe rêz li navûdeng û hurmeta wan kesan bigirin ku bal dikşînin ser wan. Divê li ser nijad, netewe, rengê çerm, ol, eslê civakî û astengdariya laşî an nexweşiya mirov îşaret û şîroveyên biçûkxistinê neke. Divê ev agahî tenê dema ku ji bo baştir têgihiştina naveroka mijara ku tê weşandin hewce be an jî eger têkiliyeke rasterast bi naveroka nûçeyê re hebe divê were weşandin.
- Divê endamên medyayê tu carî îfadeyên ne guncan ên ku zirarê bidin tenduristiya derûnî û laşî ya mirovan bikar neînin.
- Divê endamên medyayê ji pêşkêşkirina naveroka ku hêrsa civakî derdixe an nefreta civakî gur dike dûr bixin.
- Divê dev ji daxuyaniyên cudaxwaz û sûcdar ên ku ji her civakê re neheq e û dibe ku bibe sedema kîn û bêbaweriya civakî were dûrxistin.




# Nûçeyên Tenduristiyê



- Di weşanên bijîjkî de, divê ji hestiyariyeke wisa dûr bin ku dibe ku tirsek ebêbingeh an hêviyeke derewîn biafirîne û encamên lêkolînên pêşîn divê wekî “teqez” neyên pêşkêş kirin.
- Agahiyên ku ji aliyê çavkaniyên girîng ên zanistî ve nayên piştrastkirin divê neyên belavkirin.
- Navê derman û berhemên bazirganî divê bi rengekî ku rêjeya bikaranîna wan zêde bike neyê gotin.
- Navên bazirganiyê yên berhemên bijîjkî yên ku ji ber ku zirarê didin tenduristiya mirovan tên bibîranîn an jî tên sekinandin divê werin eşkerekirin.
- Dema ku pêşniyarên dermanan tên kirin, divê cih bidin ramana pisporan. Divê baldar bin ku pisporê navborî bi şîrketa dermansaziya ku ew jê re şîret dike re di têkiliyeke berjewendiyê de nîne.
- Endamên çapemeniyê yên ku li nexweşxane û navendên tenduristiyê lêkolînan dikin û hewl didin agahî û wêneyan bi dest bixin, divê nasnameya xwe nîşan bidin û bi destûra rayedaran têkevin herêmên qedexekirî.

# Kampanyayên Hilbijartinê



- Di dema hilbijartinê de divê weşan li gor biryarên Desteya Bilind a Hilbijartinê werin nirxandin.
- Ji bo weşaneke adil ku azadiya ragihandina gel diparêze û wekheviya derfetan di navbera partiyên siyasî de misoger dike, divê nûçeyên derbarê kampanyayên hilbijartinê de nêrînên ku organa medyayê bi wan re napejirîne jî hebe.
- Rêbaza ragihandina kesên ku bi nêrînên xwe ne razî ne ji bo rojnamegeriya biteraz, bêalî û azad ji bo weşandina reklam û daxuyaniyên derbarê hilbijartinan de jî derbas dibe.
- Ji ber ku lêkolînên raya giştî ya di heyamên hilbijartinê de bandorê li tercîhên dengdêran dike, divê bal were kişandin ku pêbaweriya wan di dema weşandina encamên lêkolînê de were piştrastkirin.

# Reklam


- Reklam divê bi awayekî ku wan bi rastiyan re tevlihev neke û agahiyên şaş neafirîne were pêşkêşkirin.
- Materyalên ku reklamên veşartî hene nayên bikaranîn.
- Ragihandin û reklamên ku naveroka wan neqanûnî, neguncan û ne li gor etîka medyayê ne, nayên weşandin.
- Weşandina reklamên ku tê de pêşbaziya neheq û cihêkarî heye nayê qebûlkirin.



# Weşandina Lêkolînên Raya Giştî

- Dema raporkirina rapirsînên raya giştî tê pêşniyarkirin ku rêbaza lêkolînê were weşandin (wek hejmara kesên ku bersiva anketan dane, roja ku anket pêk hatiye, navê kesê ku ferman daye ku anket were kirin) were weşandin.
- Agahiyên berfireh ên lêkolînên raya giştî yên li ser cîh, dîrok, nimûne, teknîk, kê lêkolîn kiriye û ji bo çi armancê hatiye kirin divê were ragihandin.
- Dema encamên anketên ku li ser malperan an jî bi rêya SMSê di nûçeyan de tên weşandin, divê were diyarkirin ku ji bo gihiştina encamê kîjan rêbaz hatiye bikaranîn.

# Parastina Jîngehê



- Divê endamên medyayê di çarçoweya hurmetê de û bêyî ku bêzarî li kesên derdorê bikin, alavên xwe yên weşanê bikar bînin û biparêzin.
- Di weşanan de divê ji tevgerên ku zirarê dide xweza, jîngeh û heywanan dûr bisekinin.
- Naveroka weşanê divê li ser hêmanên ku armanca wan parastina jîngehê di çarçoveya prensîbên pêşkeftina domdar de be.







# 04

# Rastkirina Nûçeyê û Mafê Bersivdayînê

SEROKOMARÎ
WEŞANÊN SEROKATIYA RAGIHANDINÊ

# 4

# RASTKIRINA NÛÇEYÊ û MAFÊ BERSIVDAYÎNÊ

## Rastkirina Nûçeyê

- Endamên medyayê mecbûr in ku hemû berpirsiyariyên kar û xebata xwe ya pîşeyî bicih bînin û di dema herî zû de agahiyên xelet rast bikin.
- Divê rastkirin bi awayekî ku ji xwendevan an jî temaşevan re bi hêsanî tê dîtin were kirin.
- Rastkirin divê bi eynî tîpan û bi eynî puntoyê li ser rûpel û sitûnên ku nûçeyên mijara rastkirinê lê cih digirin, were weşandin.
- Eger weşan ji yek cihî zêdetir were weşandin, divê nivîsa rastkirin û bersivê di hem"u çapên ku kar tê de hatine weşandin de were weşandin.
- Dema ku hat dîtin ku xeletiyek madî, daxuyaniyeke xapînok, an raporeke guhertî hatîye weşandin, divê bi lez û bez peyameke derewandin û lêborînê were belavkirin.

# Nameyên Xwîneran



- Divê weşanên bêdom nameyên xwendevanan biweşînin da ku ji xwendevanan re bibin alîkar ku ramanên xwe diyar bikin û raya giştî ava bikin.
- Nameyên xwîner eger ku avahî û naveroka wan têra vegotina ramanê bi zimanekî guncan be û were fikirîn ku ew dikarin raya giştî biafirînin divê werin weşandin. Eger guman hebe, divê edîtor nêrîna nivîskar bipirse.
- Nameyên xwendevanan divê bi navê kesê ku nameyê dişîne were weşandin.
- Tenê di rewşên awarte de di çarçoveya rêzikên edîtoriyê de, tîpên destpêkê yên nivîskar dikarin werin weşandin.
- Qedexeyên qanûnî yên ku ji sûcên hewcedarî bi ceza hene re derbas dibin, ji bo weşandina nameyên xwendevanan jî derbas dibin.
- Weşandina nameyên xwîneran bi naverokên xapînok bi prensîbên rojnamegeriyê re li hev nayê. Edîtor jî ji sêwirana stûna tîpên xwîneran berpirsiyar in.

- Eger edîtor quncika xwe ji nameyên xwîneran re li ser mijareke nakok vedike, ne mecbûr e ku her nameya ku digihîje biweşîne, lê divê ramanên cihê bi rengekî biterazû nîşan bide.
- Mafê edîtor heye ku nîqaşên nehewce yên dirêj di navbera aliyan de bibire.

## Mafê Bersivdayînê



- Di azadiya çapemeniyê de mafê hemwelatiyê ji bo agahdarbûna li ser hemû mijaran, dihewîne. Her çiqas edîtor bawer bike ku naveroka nûçe û şîroveyan rast e jî, divê pêşî li bikaranîna mafê bersivdayînê neyê girtin û biryara der barê bûyerê de ji xwîner re were hiştin.
- Ji ber ku fersenda kesê mir ku mafê xwe yê serrastkirin û bersivdayînê bi kar bîne, namîne, weşanên ku piştî mirina kesê mirî tê de daxuyaniyên biçûkxistinê hene, heya ku di berjewendiya giştî de nebe divê neyê weşandin.


- Eger kesê ku mijara nûçeyê ye neyê dîtin an jî nexwaze bersivê bide endamên çapemeniyê mecbûr in raya giştî agahdar bikin.

- Divê endamên medyayê alîkariya mijarên nûçeyan bikin ku aliyê xwe yê çîrokê nîşan bidin. Divê rê nedin ku naveroka nûçeyan ji rastiyê were dûrxistin, bûyeran yekalî werin nîşandan û tenê beşekî ji rastiyan were ragihandin.

- Divê endamê medyayê dema bikaranîna mafê bersivdayînê bi baldarî diyar bike, û hemû rêziknameyên din ên derbarê mafê bersivdayînê de, di nav de dem, bi awayekî ku mafê bersivdayînê bi awayê herî bi bandor were bikaranîn, organîze bike.







# 05

# Bikaranîna Medyaya Civakî ya ji Hêla Nûçegîhanan

SEROKOMARÎ

WEŞANÊN SEROKATIYA RAGIHANDINÊ

5


# BIKARANÎNA MEDYAYA CIVAKÎ YA JI HÊLA NÛÇEGÎHANAN

## Berpirsiyarî

- Divê endamên medyayê li gor etîk û pîvanên pîşeyî, bi haydarbûna ku nivîsên wan hêjayî nûçeyê ne, nivîsên xwe parve bikin.
- Ji bo aştiya civakî divê bikarhênerên medyaya civakî, bi taybetî jî endamên medyayê yên xwedî nasnameya saziyê, bi baldarî parve bikin.
- Endamên medyayê û bikarhênerên medyaya civakî ji tiştên ku li ser înternetê parve dikin û diweşînin berpirsiyar in.



# Hesabê Profîlê ya Bikarhêner



- Divê xwe ji hesabên nenas ên ku ji bo veşartina nasnameyan hatine vekirin û xwe ji berpirsyariya postan dûr bixin û bi nasnameyeke zelal bibin endamê kanalên medyaya civakî, bi awayekî ku berpirsiyariya qanûnî ya pêwîst hilgire û nasnameya wî ya rastîn nîşan bide.
- Divê endamên medyayê di profîla xwe ya bikarhêner de navê xwe yê rastîn bikar bînin da ku pêbaweriya xwe zêde bikin.
- Navên bikarhêner ên ku bi yên din re lihevhatî ne divê di hemî kanalên medya civakî de werin hilbijartin.


# Telîf



- Di hilbijartina wêneyan de divê mafê telîfê li ber çavan were girtin, wêneyên li gor mijarê werin hilbijartin û wêne li gor taybetmendiyên navgîna ku tên bikaranîn werin parvekirin.
- Eger jêgirek were girtin, divê çavkaniya agahiyê were nîşandan.

# Pêbaweriya Hesabên Din

- Divê tu carî neyê jibîrkirin ku medyaya civakî alaveke rêveberiya têgihiştinê ye û hesabên nenas ên di hawîrdora nîgaşî de divê bi guman were dîtin.
- Divê rêz li navên nerast û hesabên sexte neyê girtin, xuyaniya van hesaban neyê zêdekirin.
- Divê were zanîn ku hesabên botê bi gelemperî ji bo afirandina rojevên sûnî, ji bo armancên bazirganî û ji bo mebestên şahiyê xizmet dikin.
- Divê were zanîn ku hesabên ku Teşwîqkirin û mezinkirina şer û pevçûnan di hawîrdora nîgaşî de teşwîq û gur dikin, têgihiştinê belav dikin û ahenga medyaya civakî têk dibin hene.





## Bikaranîna Medyaya Civakî Di Nav Qeyranan De

- Divê mirov hay ji dezenformasyonê di rewşên wekî her kiryareke terorîstî, karesata xwezayî an bûyereke civakî de hebe, bi haydarbûna ku qirêjiya agahiyê li ser medyaya civakî zêde dibe, nemaze di heyamên krîzê de û ku hawîrdora nîgaşî ji bo armancên provokasyonê pir bi bandor tê bikaranîn.

- Dema ku naverokên ji çavkanîyên/bikarhênerên din parve dikin, divê rastbûna wan were piştrastkirin û hewildanên dezenformasyonê divê li ber çavan werin girtin.

- Divê were dîtin ku her naveroke li ser medyaya civakî îdîayek e û divê di vê çarçoveyê de were nirxandin. Agahiyên ku heta niha nehatine piştrastkirin divê neyên parvekirin, ji bo rastbûna agahiyan li ser îfadeyên kesên rayedar, sazî û dezgehên fermî werin şopandin û ji bo qirêjiya agahiyê û derewan zemîn neyê afirandin.

- Bi taybetî di serdemên hesas de, divê ji nivîsên ku dê di nav gel de tirs û fikaran çêbike, xwe dûr bixin û di vê pêvajoyê de aqilê selim were parastin.

- Di dema krîzan de girîng e ku hesabên medyaya civakî yên saziyên têkildar bi bandor were bikaranîn û rêz li rayedarên sazî û rêxistinên fermî yên dewletê were girtin.
- Ji bilî wêne û belgeyên edîtorî yên ku bi armanca agahdarkirina şaş a bikarhêneran li ser medyaya civakî, divê mirov baldar be li ser gotegot, galegal, tomarên deng û belavokên rasthatî û agahiyên ku di medyaya civakî de hatine bidestxistin ji çavkaniyên sazî û rêxistinên fermî werin piştrastkirin.
- Beriya parvekirinê, divê pêşî li girîngî û bandora nûçeyekê were girtin û li gorî wê were nirxandin.
- Di dema krîzan de, divê wêneyên kesên ku ji her bûyerekê bandor bûne, mirine an jî birîndar bûne, neyê parvekirin û divê mirov baldar be ku mafên wan kesan neyên binpêkirin û ev yek nebe sedema hêrsa civakî.



# Ziman û Vegotin



- Di parvekirinên medyaya civakî de, zimanekî rêzdar ku dûr e ji gotinên biheqaret û nefretê divê were tercîhkirin.
- Mafê parastina nehîniya jiyana taybet ku bingeha şerefa mirov e û yek ji nirxîn gerdûnî ye, divê neyê binpêkirin.
- Divê parvekirin û vegotinên ku tê şîdet û gef hene neyên kirin.
- Divê karên wekî îfşa, tacîz û zordariya sîber neyên kirin.
- Divê gavên kesane werin avêtin da ku cûdahiyên di medyaya civakî de wekî dewlemendî û hawîrdoreke aşitî û têgihiştina civakî were afirandin.
- Gotinên ku cûdahî, zordarî, acizker, nijadperest, etnîkî, olî, û êrîşa fîzîkî û biçûkxistin tê de hene, parvekirinên wan û navgînîbûn ji bo wan sûc e.

- Çawa ku di jiyanê de dibe wisa jî di medyaya civakî de, kesên ku heqaret, buxtan, dijûn naverokên ku nehînîya jiyana taybet binpê dikin, dixwazin civakê tev li hev bikin, pesnê sûc û sûcdaran û hwd. ewil dikin û yên ku wan belav dikin ji hêla hiqûqî ve berpirsiyar in.
- Berî ku hûn naverokeke di medya civakî de biecibînin û wan bi şopînerên xwe re parve bikin, baldar bin. Beşdariya parvekirina naveroka tawanbar li pêş qanûnê ye karekî berpirsiyarî ye.
- Divê mudaxele li qadên azadiya bikarhênerên din neyê kirin û parvekirinên xwedî naveroka êrişkan neyên kirin.
- Divê rêz li kesayetiya kesên din, fikr û vegotinên wan ên nepirole were girtin.
- Divê parvekirinên dijî exlakê civakê neyên kirin û divê mirov xwe ji naerokên wisa dûr bixin.



# ÇAVKANÎ


- Qanûna Çapemeniyê ya bi hejmara 5187
- Qanûna Derheqê Saziyên Radyo û Televîzyon û Xizmetên Weşanê ya bi hejmara 6112
- Komeleya Rojnamegerên DYAyê
- Yektîtiya Dîrektorên Nûçeyê Yên Radyo û Televîzyonê û Rêbazên Karê Pîşeyî û Etîkê ya DYAyê
- Rêbazên Weşangeriya Almanyayê
- Kovara Edîtorên Rojnameyên Amerîkayê
- Edîtorên Birêvebir ên Associated Press
- Rapora Pêşketinên Exlaqî yên Saziyên Çapemeniya Asyayê (1970)
- Rêbazên Pîşeya Çapemeniyê yên Meclîsa Parlamenterên Konseya Ewrupayê
- Peymana Televîzyona Derveyî Sînor a Ewrupayê
- Yekîtiya Medya, Kêfxweşî û Hunerê ya Awistiralyayê û Rêbazên Etîk ên Rojnamegeran ên ku Hatine Pêşniyarkirin
- Rêbazên Bingehîn ên Pîşeya Weşangeriyê yên Awistiryayê

- Rêbazên Rêberiya Rojnamegeriya Belçîkayê
- Rêbazên Etîk ên Pîşeya Rojnamegerên Rusyaya Spî
- Rêzikên Etîka Çapemenîya Bosna Hersekê
- Rêzikên Exlaqî yên Rojnamegeriya Bulgaristanê
- Rêbazên Rêber ên Netewyî yên Danimarkayê
- Xetên Serekî yên Rojnamegeriya Rast a Finlandiyayê
- Şertê Peywira Pîşeyî ya Rojnamegerîn Fransî
- Deklarasyona Navneteweyî ya derheqê Maf ê Berpirsiyariyên Rojnamegeran
- Rêzikên Etîk ên Xirwatistanê
- Konferansên Edîtorên Rojnameya Hindistanê: Rêzikên Etîk ên ji bo Çapemeniyê di Nûçe û Şîroveya li ser Bûyerên Civakî de (1968)
- Normên Rojnamegeriya Hindistanê
- Beyannameya Rêbazên li ser Helwestên Rojnamegerên Holendî
- Rêbazên Etîk ên Kovara Rojnamegerên Hong Kongê
- Standardên Weşanê ya Konseya Standardên Weşanê Brîtanî
- Rêzikên Bicihanînê yên Komîsyona Giliyên Çapemeniya Brîtanyayê
- Qanûna Helwestê ya Brîtanyayê
- Qanûna Helwestê ya Îrlandayê
- Rêbazên Deontolojî ya Pîşeya Rojnamegeriya Îspanyayê
- Qanûna Exlaqî ya Çapemenî, Radyo hu Televîzyona Swêdê
- Deklerasyona Peywir û Mafên Rojnamegeran ên Swîsreyê
- Beyannameya Peywirên Rojnamegeran a Îtalyayê
- Rêbazên Etîk ên Rojnamegeriyê yên Îzlandayê

- Yekîtiya Dîrektorên Nûçeyê yên Radyo û Televizyonê ya Kanadayê (RTNDA)
- Rêbazên Etîk Komeleya Rojnamegerên Katalonyayê Rêbazên Deontolojî
- Rêzikên Etîk ên Rojnamegerên Litvanyayê
- Rêbazên Exlaqî yên Kulûba Çapemeniyê û Enstîtûya Weşangeran ên Maltayê (1991)
- Rêbazên Exlaqî yên Pîşeyî yên Rojnamegerên Komara Moldovayê
- Rêbazên Exlaqî yên Çapemeniya Norveçê
- Rêbazên Exlaqî yên Yekîtiya Rojnamegerên Komara Polonyayê (1991)
- Rêbazên Deontolojî yên Rojnamegerên Portekîz
- Rêbazên Weşanê yên RTÜKê - 2014
- Rêbazên Exlaqî yên Pîşeyhi yên Rojnamegerên Rûs (1994)
- Rêzikên Etîk ên Ajansa Rojnamegerên Slovakî
- Rêbazên Rojnamegeriya Komara Slovenyayê
- Rêzikên Etîk ên Rojnamegeriyê yên Konseya Çapemeniyê ya Srî Lankayê (1981)
- Daxuyaniya li ser Twitterê ya 15ê Çiriya Paşîn a 2019an a Serokê Ragihandinê ya Koma Türkiye Prof. Dr. Fahrettin ALTUN
- Serokatiya Ragihandinê ya Komara Türkiye "Rêbera Bikaranîna Medyaya Civakî"
- Wezareta Tenduristiyê ya Komara Türkiye "Belgeya Ragihandinê ya Stratejîk a Têkoşîna bi begîbûnê – Tilyak, Tûtin, Teknolojî"
- Rêbazên Pîşeyî yên Çapemeniya Konseya Çapemeniyê ya Türkiye
- Daxuyaniya Maf û Berpirsiyariyên Rojnamegerên Türkiye
- Rêbazên Deontolojî yên Yewnanîstanê

# NÛÇEGÎHANIYA RAST

Û ETÎKA MEDYAYÊ

"Nûçegîhaniya Rast û Etîka Medyayê" ji aliyê Serokatiya Ragihandina Serokomariya me ve bi prensîbên ku di çarçoveya mînakên cîhanê de hatine berhevkirin û sîstematîzekirin, ji bo hêsankirina karê endamên çapemeniyê yên ku armanca wan ragihandina rast e, wekî rêbernameyekê hatiye amadekirin.

Ev rêbernameya ku di encama kedeke mezin de hatiye amadekirin û di qada xwe de weşana herî berfireh e, ji bo xebatkarên çapemeniyê û lêkolînerên têkoşîna heqîqetê çavkaniyeke girîng e. Di rêbernameyê de, prensîbên ku bi bikaranîna kodên exlaqî yên ku di qada medyayê de li çaraliyê cîhanê hatine pejirandin, bi kategorîzekirina wan di bin sernavên "Endamtiya Pîşeyî", "Çavkaniya Nûçeyan", "Awayê Pêşkêşkirina Nûçeyê", "Rastkirina Nûçeyê û Mafê Bersivdayînê" û “Bikaranîna Medyaya Civakî Ji Hêla Nûçegîhanan Ve” hatine pêşkêşkirin.

Em dixwazin vê xebata ku me di çarçoveya mînakên cîhanê de wek rêbernameyeke jêhatî amade kiriye û ji bo berjewendiya medya û miletê xwe pêşkêş kiriye, bi taybetî jî bigihînin rojeva raya giştî.

ISBN: 978-625-6281-37-0
9 786256 281370